şopdara rastiyê ye
Hejmar :404 nameronahi@gmail.com 1- Tîrmeh - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Navenda Jîn vejandina rojnamegeriya Kurdî ye






Dîroka Silêmaniyê kêmî 200 sal e. Li tevî vê jî dîrokek a tijî çalakiyên edebî, hunerî, rojnamegerî û siyasî heye. Ev kevneşopiya ji kevin ve tê, hê jî berdewam dike.
Li bajarê Silêmaniyê gelek navendên ji bo pêşxistina vejandina edebiyat, huner û rojnameriyê hene. Yek ji van navendan jî navenda, Jîn a ji bo vejandina çanda rojnamgeriya Kurdî ye. Ev 15 sal e ev navend ji bo zindîkirina rojname, destnivîs û edebiyatê kar dike.
Yek ji damezrenêrê navenda Jîn Sidîq Salih li ser dîroka navendê axivî û diyarkir ku navenda Jîn fikrê Newşîrwan Mistefa bû û wiha axivî; "Peywendiya rewşenbîrî ya min û birayê min mamosta Refîq li gel wî hebû. Wê demê xerîkê nivîsandina dîroka rojnamgeriya Kurdî bû. Di bin berpirsyartiya wî û mamosta Refîq de pirtûkxaneyek dewlemend heye û gelek pirtûk, kovar û rojname tê de hene. alîkariya me dikir."
Salih li ser dema despêkirina karê xwe jî got; "Di sala 2000'an de projeya



zindîkirina rojname û kovara Kurdî destpêkir. Di vê der barê de kesên wek Dr. Kemal Fuad û mamosta Cemal Xeznedar kar li ser vê yekê kiribûn û me ev karê wan gelek girîng didît. Me xwest em vê projeyê berdewam bikin. Hemû hejmarên govar û rojnameyên Kurdî bi dest nakevin, ew ên heyîn jî di rewşek gelek xerab dene. Ji bo vê em vî karî ji bo xwe weke erkek nîştimanî dizanin."
Salih anî ziman ku dema ku wan nû dest bi vî karî kir, dezgehek a wan tine bû û wan di mal de karê paqijkirina kopyekirina wan rojnameyan dikir. Salih diyarkir ku ev yek demek dirêj bi xwe digirt û wan her yek ji wan du caran li dezgehên Silêmaniyê çap dikirin.
Di Adara 2004'an de navenda bi Jîn destûra fermî ji Wezareta Rewşenbîrî ya îdareya Silêmanî ya Hikûmeta Herêma Kurdistan wergirt. Di Tebaxa 2004'an de dest bi kar kiriye.
Li ser hilbijartin û sedemê navê Jîn jî Sidîq Salih got ku ji bo zindîkirina navê Govara Jîn û zindîkirina navê rojnameya Pîremêrd e û wiha domkir; "Li Navenda Jîn gelek beş hatine vekirin, beşa Makro Film jî beşek ji vê ye. Ev beş ji bo wergirtina belgename, dest nivîsa pirtûk û rojnameyane. Bi rêya Maykro Film ew kel û pel dikare 400 sal bê parastin û bimîne. Beşek din jî ya deng û reng e. Divê beşê de jî vîdeo û wêne tên parastin."

### KOMKIRINA DESTNIVÎSÊN KEVN

Beşek din jî ya di nava navenda Jîn de, beşa komkirin û parastina destnivîsê ye.
Di vî beşê de zêdetirî 600 destnîvîsên îsal heye. Ev yek ji bilî yên kevin e.
Li Navenda Jîn sindoqek taybet ji bo rakirina destnivîs, babetên binirx û yên girîng heye. Divê sindoqê de, destnivîs li gorî zanistê hatiye dabeş kirin. Zindîkirina destnivîsên kevin beşek girîng yê navenda Jînê ye.
Di vê beşê de hinek karmendên perwerde kirî hene û pêre mijûl dibin. Salih li ser vê yekê jî got; "Em niha bi kel û pelên xirabûyî ve mijolin. Em wana paqij dikin û çareser dikin. Li vir em vana nû dikin û zêde dikin."

### DESTNIVÎSA ROJNAMÊ Û KOVARÊN KEVN

Beşa berg yê destnivîs, rojname û govarên kevin jî beşek din ê navenda Jînê ye. navenda Jîn li ser vê yekê jî kar dike û ji bo zindîkirinê xebat dide meşandin. Ji bo beşa berg çermê xwezayî tê bikaranîn.

### PIRTÛKXANE BEŞEK JI NAVENDA JÎN E

Pirtûkxane beşek din ê girîng yê vê navendê ye û gelek girîngî pê tê dayîn. Cihek mezin jêre hatiye veqetandin. Di pirtûkxaneyê de cih ji bo zimanên Kurd, Erebî, Tirkî, Tirkiya Osmanî, Farisî, Ingilîzî û Frensî hatiye veqetandin. Hinek ji nivîskar û rewşenbîr jî pirtûkên xwe pêşkêşî navenda Jînê kirine. Pirtûkxaneya Hîlal Nacî ku rewşenbîrek mezin ê Ereb bû daxwaz kiribû ku pirtûkxaneya xwe bide Celal Telebanî. Lê ji ber nexweşiya Telebanî ev yek pêknehat. Divê pirtûkxaneyê de nêzîk 11 hezar pirtûk hene û pêşkêşî navenda Jîn hatiye kirin.
Navenda Jîn gelek mezine. Gelek govar, rojname û berg têde hatine parastin. Ji rojnameya Iraq û Cimhurî ya serdema Baasê bigre heya rojnameyên Kurdistanê yên niha di nava vê navendê de cih digrin...*ROJNEWS*

## Tendurustiya mirov berî her tiştî ye



Endama Dermangeha Nexweşxaneya Ş. Lêgerîn, Malva Hesen derbarê tenduristiyê de ragihand ku divê her mirov li tenduristiya xwe miqate bin û wiha got, "têndiristî hêza mirova ye. Bi taybet jî divê mirov her roj bimeşin û werzîşê bikin ku bedena mirov her zindî bimîne."
Endama Dermangeha Nexweşxaneya Ş. Lêgerîn, Malva Hesen derbarê tenduristiyê de anî ziman ku bi taybet di germahiyê de divê mirov xwe biparêzin û tiştên bi av zêdê vexwin, li ber tavê zêde nemînin û got: "Ji bo temenekî dirêj û jiyanek xweş divê mirov li tenduristiya xwe miqatebin."
Malva Hesen bal kişand ser dermanên ku jin ji bo zeyif bibin, bi kar tînin û got: "Divê mirov xwe ji dermanê ji bo zeyifbûnê û ji antîbiyotîkên zêde xwe biparêzin. Dermanên zeyifbûnê û antîbiyotîk dema pir zêde bê bikaranîn zirarek mezin dide bedena mirovan. Mirov bêtir dermanên xwezayî bi kar bînin çêtir e."

**DIVÊ SPOR BÊ KIRIN**

Malvayê anî ziman ku ji bo tenduristiya mirovan werzîş gelek girîng e û wiha dewam kir: "Mirov divê her roj bimeşin û werzîşê bikin ku di warê tenduristiyê de pirsgirêkan nejîn. Her wiha divê mirov xwe ji emeliyatên estetîkê jî biparêzin. Ev yek mirovan neheret dike û zirarê dide derûniya wan."

**DERMANÊN XWEZAYÎ**

Malva Hesen bang li hemû mirovan kir ku dermanên xwezayî bi kar bînin û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Divê mirov bi amûrên kapîtalîzmê neyên xapandin û timî xwe biparêzin."..
Sorgul ŞÊXO

## Rêyên gundên Şehbayê tên sererastkirin




Şaredariya Gel a navçeya Ehresê ya girêdayî Şehbayê riya di navbera navçeyê û gundê Til Qerahê de ku di enacama şer û barîna baranan de xirab bûye, sererast kir.
Piştî gilî û gazincên şêniyên herêmê ji xirabûna rêya di navbera navçeya Ehresê û gundê Til Qerah, Şaredaiya Gel a navçeya Ehresê dest bi sererastkirina rê kir.
Şaredarî sê rojan xebatên sererastkirinê dewam kirin û ji bo vê jî amûrên di destên xwe xist xizmetê.
Dirêjahiya rêya ku ji ber şerên ku li herêmê rû dane û ji ber barîna baranê xirab bûye 25 km ye.
Derbarê mijarê de Hevseroka Şaredariya Gel a navçeyê Bêrîvan Umer got ku erka şaredariyê ye ku gilî û gazincên gel bigire û jê re çareseriyê bibîne.

nameronahi@gmail.com Hejmar : 404 1- Tîrmeh - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Herêmek 600 km² hate rizgarkirin



Berdevka Pêngava Bagera Cizîrê Lîlwa Ebdullah li ser pêngava paqijkirina gundewarên Hesekê axivî û diyar kir ku di pêngava rizgarkirina bajarokê Dişîşa de gelek gavên girîng hatine avêtin. Lîlwa got, "pêngava rizgarkirina bejahiya Hesekê de heta niha qadeke ji 600 kîlometreçargoşeyî hatiye rizgarkirin û 274 çete hatin kuştin û 13 çete jî dîl hatin girtin."*R-2*

# LI EFRÎNÊ TEROR SÎNORAN NAS NAKE

Li Efrînê her roj mirovên sivîl tên revandin û bi rengekî hovane tênkuştin. Dewleta Tirk ya dagirker ku axa bakurê Sûriyê dagir kiriye her roj li pêş çavên cîhanê sûcên mirovahiyê pêk tîne. Li Efrîna dagirkirî bi her awayî zilm, zordarî û terorê dimeşîne.



### ZILM DEWAM DIKE

Kiryarên dewleta Tirk û çeteyên wê li Efrînê her roj bê navber dewam dike. Dewleta Tirk tevî çeteyên xwe piştî ku Efrîn dagirkirin dest bi kiryarên dij mirovî kirin. Demografya herêmê diguherin, mirovan direvînin êşkence li wan dikin û li hember berdana wan pereyan dixwazin û hinekan jî dikujin. Her mal û milkên gel talan dikin û cihên pîroz hildiweşînin. Lê cîhan li hemberî van kiryaran heta niha jî bêdeng e.

### 3 KESÊN DIN HATIN KUŞTIN

Li Li navçeya Şêrewa ya Efrînê, du ciwanên bi navê Mihemed Elî yê 17 salî û Xelef ê 35 salî ku 4 roj bû wenda bûn, cenazeyên wan hatin dîtin. Şahidan gotin, çeteyên El Hamza ên dewleta Tirk, çend roj beriya windabûna Mihemmed Elî û Xelef, gef li wan xwarin. Ji aliyê dinve hat gotin jina bi navê Fatma Hamke ya 66 salî a Êzidî, 27'ê Hezîranê dema li gundê Qitmê yê Efrînê bû, çeteyan nîvê şevê bombeyek avête mala lê dima û jiyana xwe ji dest daye. *R-2*

## Zîlanê trajediya Kurdan ji hev xist



Endamê Konseya Serokatiya Giştî ya KCK'ê Alî Haydar Kaytan, di salvegera 22'an a çalakiya Zîlanê de axivî û diyar kir ku çalakiya Zîlanê trajediya kolekirina Kurdan têk bir. Kaytan wiha got, "Dijmin konsepteke êrîşan pêş xistibû. Li dijî gelê Kurd êrîşên qirkirinê pêk dihatin. Li ser rêber Apo êrîş hebûn. Hevala Zîlan bi çalakiya xwe bersiv da van êrîşan." *R-4*




## Bila leşkerên tirk ji başûr derkevin

Meclîsa Xweseriya Demokratîk a Şengalê li Xanesora Şengalê daxuyaniyek da û xwest ku dewleta Tirk ku axa başûr dagir kiriye tavilê jê derkeve. Di daxuyaniyê de wiha hat gotin, "Dewleta Tirk di bin sîwana PDK'ê de êrîş dike û dixwaze destketiyên başûr têk bibe. Lewma divê Rêveberiya Iraqê ya Başûrê Kurdistanê helwestek zelal nîşan bidin. *R-5*

## Dewleta tirk dixwaze aramiya li Minbicê têk bibe




Endama Meclîsa Jinê ya Minbicê Hena Şerîf da zanîn ku niha li Minbicê jiyanek demokratîk heye û gel bajarê xwe bi rêve dibe. Hena wiha got, "Niha rewşek aram û wekhev bi têkoşîna QSD'ê hat avakirin lewma pêdivî bi Tirkiyê tuneye. Dewleta Tirk dixwaze aramiya li Minbicê têk bibe. Em dewleta tirk li ser axa Minbicê naxwazin." *R-3*

## Pêşengê şer fermandar Rizgar



Fermandariya Giştî ya YPG'ê bi daxuyaniyekê ragihand ku di pêngava duyem a Berxwedana Serdemê de fermandar Rizgar jî di nav de 6 şervanên wan bi rihekî fedayî heya guleya xwe ya dawî şer kirine û gihiştine şehadetê. Fermandariyê wiha got, "Fermandarê hûnera şer hevalê Rizgar bi cesareta xwe ya mezin hertim bûye fermandarek mînak. Em wek hevalên wî, soza dewamkirina berxwedanê û serkeftina tekoşînê didin." *R-5*

## Piştgiriya bi nobeda azadiyê re mezin dibe



Nobeda ji bo azadiya Ocalan' a li ber avahiya Konseya Ewropayê 6 sal li pey xwe hişt û Kurdistanî û dostên xwe diyar dikin ku heya Ocalan azad bibe wê vê çalakiyê berdewam bikin. parlementerên başûrê Kurdistanê û parlementerên HDP'ê jî piştgirî dan çalakiya nobeda azadiya Ocalan. *R-5*

## Tirkiye li bakurê Sûriyê dagirker e



Hiqûqnasên kantona Girê Spî diyar kirin ku siyaseta Tirkiyê li Bakurê Sûriyê siyaseteke "dagirkeriyê" ye û hewl dide fitne û tevliheviyan di navbera gelên Sûriyê de derxîne. Hiqûqnasan wiha got, "Tirkiyê ala xwe li Sûriyê bilind kiriye lê cîhan li hember vê yekê bê deng e. Em dagirkeriya Tirkiyê qebûl nakin." *R-4*

## AKP'ê di hilbijartinê de hîle û zext kir



Heyetek ji nûnerên partiyên siyasî yên Ewropa ku ji bo şopandina hilbijartina çûbûn Kurdistanê, daxuyaniyek dan çapemeniyê û diyar kirin ku AKP'ê di hilbijartinê de serî li hîle û zextan da. heyetê got, "Yekîneyên leşkeran di pêvajoya hilbijartinê de aktîv bûn; li nava hemû buroyên hilbijartinê de cih girtin. Hemû armanca dewletê tepisandina HDP'ê bû." *R-4*

## Wê projeya demokratîk bi ser kev e



Hevseroka Meclisa Sûriya Demokratîk MSD'ê Îlham Ehmed di Kongreya Damezirîner a Meclisa Ciwanên Reqayê de axivî û diyar kir ku ew amade ne ji bo danîna destûra nû ya Sûriyê bi rêjîma Sûriyê re danûstandinan bikin. Îlham wiha got, "Tevî hemû hewldanên li dijî gelên Sûriyê jî wê projeya demokratîk bi ser bikeve." *R-4*

## Diyalogên me bi rêjîmê re çênebûne




Navenda Têkiliyên Doplomasî ya TEV-DEM'ê diyar kir ku di navbera wan û rêjîma Sûriyê de ti danûstendin çê nebûne. TEV-DEM'ê got, "Danûstandinên bi armanca çareserî, aramî û ewleahiya Sûriyê bi her aliyekî Sûriyeyî re ne şaş e. Lê heta niha bi rêjîmê re hevdîtinên me pêk nehatine." *R-5*

## Xeta me ya Şêx Seîd e



Civaka Îslamî ya Kurdistanê, Şêx Seîd di salvegera darvekirina wî de bi bîr anî. Civaka Îslamî ya Kurdistanê destnîşan kir ku di mijara dîn de xeta wan Şêx Seîd e û got, "Em wan kes û hêzan şermezar dikin ku navê wî bi kar tînin û bi vî rengî kiryarên xwe vedişêrin. Tevî zehmetî, mêtingerî û zilmê jî ev têkoşîn wê bi ser bikeve û zalim têk biçin." *R-2*

## 120 hezar sivîl ji ber êrîşan reviyan



Di operasyona rejîma Sûriyê, ya rojavayê başûr ê welêt de ji 120 hezarî zêdetir sivîlan malên xwe berdan. Mala Çavdêr a Mafê Mirovan a Sûriyê, "bi hezaran sivîl li ser sînorê Urdunê gihane cem hev, bi hezaran jî nêzî girên Golanê bûne." *R-2*

## Keştî bin av bû, 100 kes winda ne

Trajediya koçberan ya li ser behran bi dawî nabe. Heta niha ji bo ku derbasî Ewropa bibin bi hezaran kes di behran de xeniqîn. Li peravên Lîbyayê keştiya ku koçber li nav bû noqî avê bû. Di encamê de cenazeyê 3 pitikan hate dîtin û nêzî 100 kes winda ne. *R-2*

# Cîhan li hember Efrînê bêdeng e

***Li Efrînê her roj mirovên sivîl tên revandin û bi rengekî hovane tênkuştin. Dewleta Tirk ya dagirker ku axa bakurê Sûriyê dagir kiriye her roj li pêş çavên cîhanê sûcên mirovahiyê pêk tîne. Li Efrîna dagirkirî bi her awayî zilm, zordarî û terorê dimeşîne.***



Li Efrînê cenazeyên 2 ciwanên din hatin dîtin ku çeteyên dewleta Tirk a dagirker gef li wan dixwarin.
Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê yên li Efrînê roj bi roj sûcên giran li dijî mirovahiyê dikin. Sûcên; revandina mirovan, destavêtin, talan, xwestina fîdye û komkujî her roj zêde dibin.
Li navçeya Şêrewa ya Efrînê, du ciwanên ku 4 roj bû wenda bûn, cenazeyên wan hatin dîtin.
Çavkaniyên herêmî ragihandin, Mihemmed Elî yê 17 salî û welatiyê Ereb ê bi navê Xelef ê 35 salî ku bavê 3 zarokan bûn, beriya bi 4 rojan li gundê Birc Evdalo yê navçeya Şêrewa ya Efrînê winda bûn. Cenazeyên her du kesan li nava bexçeyên hinara yên gundê Birc Evdalo hatin dîtin.
Xelef, piştî ku şerê navxweyî yê Sûriyê dest pê kir, xwe li herêma Efrînê ku herêma ewle bû, girtibû. Şahidan gotin, çeteyên El Hamza ên dewleta Tirk a dagirker, çend roj beriya windabûna Mihemmed Elî û Xelef, gef li wan xwarin.
Li Efrînê jinek din hate qetilkirin
Ji aliyê din ve jineke din a Êzidî ji aliyê çeteyên hevkarên dewleta Tirk ve hate qetilkirin.
Li gorî agahiyên ji çavkaniyeke herêmî ya Efrînê hate girtin, jineke din a Êzidî ji aliyê çeteyên girêdayî dewleta Tirk ve hate qetilkirin.
Hate ragihandin ku Fatma Hamke ya 66 salî, 27'ê Hezîranê dema li gundê Qatma yê Efrînê bû, çeteyên girêdayî artêşa Tirk a dagirker nîvê şevê bombeyek avête mala lê dima û jiyana xwe ji dest daye. Hamke bi malbata xwe re dijiya.
Piştî leşkerên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê Efrîn dagirkirin û şûnde, hevjîna Fatma Hamke Henan Bayram jî girtibûn piştî êşkenceyên giran û şûnde berdabûn.
Li gorî çavkaniyên herêmî piştî ku Henan Bayram hate berdan û şûnde zext û zordariya li ser malbatê zêdetir bibûn.

## Herêmek 600 km² hate rizgarkirin

Berdevka Pêngava Bagera Cizîrê Lîlwa Ebdullah diyar kir ku di pêngava rizgarkirina bejahiya Hesekê de heta niha qadeke ji 600 kîlometreçargoşeyî hatiye rizgarkirin û 274 çete hatin kuştin.
Berdevka Pêngava Bagera Cizîrê Lîlwa Ebdullah li ser pêngava paqijkirina gundewarên Hesekê axivî û diyar kir ku di pêngava rizgarkirina bajarokê Dişîşa de gelek gavên girîng hatine avêtin.
Lîlwa Ebdullah diyar kir, sînorê Iraq-Sûriyê ji xeteriya DAÎŞ'ê hatiye rizgarkirin û got, "Di vê pêngavê de hebûna DAÎŞ'ê ya li herêmê ji holê hate rakirin."
Lîlwa bi bîr xist ku pêngava rizgarkirina bajarokê Dişîşayê 3'ê Hezîrana 2018'an j du baskan ve li Şedadê û Holê dest pê kir û li gel bajarokê Dişîşa qadeke ji 600 kîlometreçargoşeyî ya gund û gundik tê de ne hatiye paqijkirin.
Lîlwa Ebdullah işaret bi hevkariya hêzên QSD û hêzên Iraqê kir û got, armanca me ji vê yekê, parastina sînorê Sûriye û Iraqê ye.

**BI SEDAN SIVÎL HATIN RIZGARKIRIN**

Di dewama axaftina xwe de Lîlwa Ebdullah got, "Hêzên QSD'ê bi sedan sivîl rizgar kirin û piştî paqijkirina herêmê wan vedigerînin cih û warên xwe. Tîmên rakirina mayinan jî herêmê ji teqemeniyên çeteyên DAÎŞ'ê paqij dikin."

**274 ÇETE HATIN KUŞTIN**

Lîlwa Ebdullah destnîşan kir ku di şerê navbera şervanên QSD'ê û çeteyên DAÎŞ'ê 274 çete hatine kuştin ku 4 ji wan emîr in û 13 jî dîl hatin girtin.

**ÊRÎŞÊN DESTEKA JI BO ÇETEYAN E**

Fermandar Lîlwa Ebdullah işaret bi êrîş û dagirkeriya dewleta Tirk kir û got, "Ne cara yekê ye ku dewleta Tirk êrîşê dibe ser hêzên me yên QSD'ê. Em li aliyekî sivîlan ji terora çeteyên DAÎŞ'êxelas dikin û dewleta Tirk ji aliyekî din ve êrîşî Rojava-Bakurê Sûriyê dike. Vê yekê ji bo destekdayina çeteyên DAÎŞ'ê dike.
Ji aliyê din ve hêzên rejîmê di pêngava rizgarkirina Dêra Zorê êrîşî hêzên me kirin. Lê şervanan bersiv dan êrîşan. Em dibêjin ku armanca me parastina yekîtiya welat û parastina sînorê wê ye."



Berdevka Pêngava Bagera Cizîrê Lîlwa Ebdullah di dawiya axftina xwe de da zanîn ku tevlîbûna hêzên YPJ'ê li Pêngava Bagera Cizîrê morala serketinê da sivîlan.

## 120 hezar sivîl ji ber êrîşan reviyan



Di operasyona rejîma Sûriyê, ya rojavayê başûr ê welêt de ji 120 hezarî zêdetir sivîl malên xwe berdan.Mala Çavdêr a Mafê Mirovan a Sûriyê got bi hezaran sivîl li ser sînorê Urdunê gihane cem hev, bi hezaran jî nêzî platoya Golanê bûne.Midûrê Mala Çavdêr a Mafê Mirovan a Sûriyê Ramî Abdulrahman ji AFP'ê re axivî, got, "hêzên hikûmetê û hevalbendên wê bi pêş ve diçin, hema hema hemû sivîlên li hêla rojhilat a Derayê reviyane."
Hate gotin beşek ji sivîlan çûne qada bi kontrola hikûmetê.
Hêzên rejîmê yên bi piştgiriya Moskowê ji 19'ê Hezîranê ve herêma Derayê bombe dikin. Dera yek ji wan deveran e ku çalakiyên protestoyî yên dijî rejîma Esad lê dest pê kiribû. 70 ji 100'î yê vê herêmê bi kontrola komên çekdar e. DYA'yê desteka xwe ji van koman kişand. Rejîma Enqerê operasyonên li Dera û Kuneytrayê yên hêzên Esad şermezar kir lê derbarê Rûsya de xwe kerr û lal kir. Komên çekdar ên li vê herêmê bi taybetî ji Enqerê destekê dibînin.

## 12 DAÎŞ'î bi dar ve hatin kirin



Piştî ku Serokwezîrê Iraqê Haydar El Ebadî ferman da ku mehkûmên DAÎŞ'î yekser bên darvekirin, 12 kes bi dar ve hatin kirin.Di daxuyaniya Serokwezaretiyê de hate ragihandin, piştî ku Ebadî roja Pêncşemê ji bo îdamê ferman da, 12 ji 'terorîst'ên bi cezayê îdamê hatibûn mehkûmkirin, bi dar ve hatine kirin. Hate gotin, cezayê van kesan zelal bûbû û ji aliyê Serokkomariyê ve jî hatibû erêkirin.Du roj piştî ku cenazeyên 8 kesên ji aliyê çeteyên DAÎŞ'ê ve hatibûn revandin hate dîtin, 12 mehkûm bi dar ve hatin kirin. Çeteyan li ser kesên revandî dîmenek weşandibû û gef xwaribûn ku eger DAÎŞ'iyên jin ên girtî neyên berdan wê rehîneyan bikujin.
Ebadî jî weke bersiv ji dîtina cenazeyên 8 kesan, ferman dabû ku DAÎŞ'iyên ku cezayê îdamê yê li wan hatiye birîn bê îdamkirin.Li Iraqê li zêdeyî 300 çeteyên DAÎŞ'ê ku 100 ji wan biyanî ne cezayê îdamê hatiye birîn.

## Keştî bin av bû, 100 kes winda ne

Trajediya koçberan ya li ser behran bi dawî nabe. Heta niha ji bo ku derbasî Ewropa bibin bi hezaran kes di behran de xeniqîn.
Li peravên Lîbyayê keştiya ku koçber li nav bû noqî avê bû. Di encamê de cenazeyê 3 pitikan hate dîtin û nêzî 100 kes winda ne.
Trajediya koçberan ya li ser behran bi dawî nabe. Heta niha ji bo ku derbasî Ewropa bibin bi hezaran kes di behran de xeniqîn.
Rayedar diyar dikin ku di keştiyê de 120 kes hene. 16 kes rizgarkirine û birine herêma El Hmidiye ya 25 km dikeve rojhilatê paytext Trablûsê.



Hate diyarkirin ku ji behrê cenazeyê 3 pitikan hatiye derxistin, nêzî 100 kes jî winda ne.
Ji beriya niha li rojhilatê Trablûsê keştiyeke ku 200 kes li nav bû hatibû diyarkirin. Ji sala 2014'an û vir ve di vê rêyê de nêzî 650 hezar koçber li ser Behra Spî re derbasî Ewropa bûne.

## Xeta me ya Şêx Seîd e

Civaka Îslamî ya Kurdistanê, Şêx Seîd di salvegera darvekirina wî de bi bîr anî.
Di peyamê de hate gotin, "Di şexsê Şêx Seîd de ku rêberê olî û milî yê gelê me ye, em hemû şehîdên Kurdistanê bi bîr tînin û careke din dibêjin ku wê têkoşîna wan teqez bi ser bikeve."
Civaka Îslamî ya Kurdistanê destnîşan kir ku di mijara dîn de xeta wan Şêx Seîd e û wiha dewam kir: "Em careke din wan kes û hêzan şermezar dikin ku navê wî bi kar tînin û bi vî rengî kiryarên xwe vedişêrin û dînê me diherimînin."
Di dewama daxuyaniyê de hate gotin, "Tevî zor, zehmetî, mêtingerî û zilmê jî ev têkoşîn wê bi ser bikeve" û zalim têk biçin.
Civaka Îslamî ya Kurdistanê herî dawî got, "Bila ruhê Şêx Seîd, hevalên wî û hemû şehîdên Kurdistanê şa be."



# Şanoya "Dûvê Hespê" hate pêşkêşkirin

***Desteya Çand û Hunerê bi hevkariya Rêveberiya Kampa Serdemê Şanoyek bi navê" Dûvê Hespê" li kampê pêşkêş kir. Armanca ji pêşkêşkirina şanoyê ew e ku moral bidin şênî û zarokên ku derûniya wan di encama êrîşên dagirkeriya li ser Efrînê de xirab bûye.***



Desteya Çand û Hunerê bi hevkariya Rêveberiya Kampa Serdemê Şanoyek bi navê" Dûvê Hespê" li kampê pêşkêş kir.
Piştî hefteyek ji amadekeriyan endamên Desteya Çand û Hunerê ya kantona Efrînê şanoya bi navê "Dûvê Hespê" îro li kampa Serdemê pêşkeş kir. Şano bi amadebûna bi dehan şênî û zarokên li kampa serdemê hate pêşkêşkirin.
Armanca ji pêşkêşkirina şanoyê ew e ku li ser rûyê şênî û zarokên ku derûniya wan di encama êrîşên dagirkeriya li ser Efrînê de xirab bûye, ji nû ve kenê xêz bikin.
Nameya şanoyê ew bû, "em bawerî bi dijmin nekin ji ber ku di her kêliyekê de dikare xiyanetê bike."…*ANHA*

## Gotinên pêşiyan û biwêjên kurdî kir pirtûk



Rojnameger Murat Akkuş gotinên pêşiyan û biwêjên kurdî yên li taziye, dawet û qehwexaneyan berhev kir û kir pirtûk.Rojnameger Murat Akkuş li herêma Îdirê hem rojnamegeriyê dike û hem jî ketiye pey peyv, gotinên pêşiyan û biwêjên kurd.
Akkuş li taziyeyan, dawetan, qehwexaneyan û şîn û şahiyan geriya û gotin û biwêjên kurdî berhev kir. Piştî berhevkirinê pirtûka bi navê "Gotin û biwêjên kurdan" derxist. Pirtûk ji 371 rûpelan pêk tê û 6 hezar û 650 peyv û biwêj têde cih digirin. Akkuş anî ziman ku wî keda xwe ya 30 salan daye vê pirtûkê û got: "Li her cihê ez diçûmê extiyaran gotinên kurdî digotin. Ev gotin li xweşa min diçûn. Min jî van gotinên wan di lênûska xwe de dinivîsand. Di 30 salî de li her devera ez çûmê min peyv, biwêj û gotinên pêşiyan nivîsand. Di pirtûkê de li ser jinan, çand, zeyendî, huner, civak, jiyan, siyasî û her qadê jiyanê biwêj û gotinên pêşiyan têde hene."

**DÊ ÇÎROKAN JÎ BINIVÎSÎNE**

Akkuş da zanîn ku gelek mirovên wî li wan guhdar kiriye niha ne li jiyanê ne, lê gotin û biwêjên ji wan girtiye di pirtûkê hene û hemû biwêj û gotinên pêşiyan yên herêma Serhedê ne. Akkuş anî ziman ku ji ber pirtûk bi kurdî bû kesî nedixwest çap bike û OHAL'ê jê re kirin e hincet û herî dawî çapxaneyek li Kayseriyê dîtiye û çap kiriye. Akkuş got ku ew ê nivîsandina çîrokên kurdî û çîrokên evînên kurdî binivîsîne.

**KEDA 30 SALAN**

Akkuş diyar kir ku ew ji pola lîseyê ya duyemîn ve dest bi berhevkirina gotinên pêşiyan û biwêjan kiriye û di encama xebat û keda 30 salan de berhemek wiha derxistiye. Akkuş destnîşan kir ku her gotinek xwedî çîrokek e û li ser her qadên jiyanê gotin di pirtûka wî de cih digirin. Akkuş da zanîn ku ev jî xizmeta pêşketina zimanê kurdî ye û hemû taybemendiya gotinên pêşiyan û biwêjên herêma Serhedê binivîsîne…*MA*

## Serlêdana Pêşbirka Denîz Firat hate dirêjkirin



Komîteya Amadekar a Pêşbirka 4'emîn a Wêne, Çîrok û Helbestan a Denîz Fîrat ji ber şert û mercên dereng gihiştina berhemên girtiyan biryara serlêdana dema pişbirkê heta 5'ê Tîrmehê dirêj kir.Komîteya Pêşbirka 4'emîn a Wêne, Çîrok û Helbestan a Denîz Firat ku îsal diyarî Şehîdê Çapemeniyê Rizgar Denîz ê dema Pêngava Bagara Cizîrê li Dêra Zorê dişopan di encama êrîşeke întixarî de şehîd bibû, ji ber mercên direng agahdarbûna girtiyan û gihiştina berhemên wan biryar da ku serlêdana pêşbirkê ya ku wê 25'ê Hezîranê bi dawî biba heta 5'ê Tîrmehê dirêj kir.
Komîteyên bi vê boneyê dîsa bang li her kesê kir ku bi berhemên xwe tevlî pêşbirkê bibin.

## Mûzîka kurdî nebuya, dibe ku zimanê kurdî winda buya

Hunermend Jan Axîn ê ku bi tarzê rockê ya kurdî û carna bi stranên klasîk ên kurdî distrê diyar kir ku guhdariya muzîkê kir ku muzîkjenî li wî peyda bibe û ew di bin bandora hunermendên kurd ên klasîk de maye û wan hunermendan wek awêneya muzîka kurdî pênase kir. Axîn diyar kir ku ew piştî demek dirêj bi berhema xwe ya "Zerîba" li pêşberî hezkiriyên muzîka kurdî ye, lê çanda populîzmê nahêle muzîka kurdî li pêş bikeve.Hunermendê muzîka rockê ya kurdî Jan Axîn ku carna stranên klasîk jî distirê, bi albûmek nû derket pêşberî hezkiriyên xwe ango muzîkhezan. Hunermend Axîn piştî albûmên "Bajar" û "Evînên Şikestî" demek dirêj şûn ve albûma "Zerîba" derxist. Berhema Axîn xwerû ji kurdî pêk tê û bi gotina wî naveroka stranên wî her tim mirovan ber bi rê ve dibin.
Hunermend axîn hunermendên klasîkî yên kurd bi bîr anî û got, "Hunermend Miradê Kinê, Miheme Arîfê Cîzrawî, Mihemed Şêxo, Ayşe Şan, Meryem Xan û yên din îro bingehek mezin ji me re ava kirin e û awêneya muzîka kurdî ne. Hunermendên mîna Miradê Kinê, Miheme Arifê Cîzrawî, Tahsîn Taha, Mihemed Şêxo, Ayşe Şan, Meryem Xan û gelek hunermendên îro xurtbûyîna me û bingeha me ne. Ez di bin bandora wan de mam e. Bi taybetî dikarim hinekî li ser Miradê Kinê (Miradko) bisekinim. Mirovekî gelek serbest e. Dikare bi awayek jixweberî stranek çêke û lê bide û bêje. Xwedî taybetmendiyek mezintirîn e. Mînak divê ku her kes "Xezal xezal" ji Miheme Arîfê Cizrawî guhdar bike. Kes nikare wek wî bêje. Îro dema em çi çaxê behsa muzîka kurdî ya klasîk bikin, em neçarin navê van hunermendên hêja bînin ziman. Ji wan kevintirîn jî hene. Em dikarin heta Evdalê Zeynikê jî biçin. Lê wê komê îro bingehek mezin ji me re ava kirin e û awêneya muzîka kurdî ne. Min muzîka kurdî bi wan nas kir. Heke îro bingehek min hebe, ew bingeh ji wan tê. Em jî li ser rê û rêça wan diçin. Ez muzîkek rockê ango ewropî çêdikim lê bes, ez nikarim ji wî ruhê muzîka kurdî ya klasîk dûr bikevim. Ez pê ve girêdayî me.
Muzîk hunerek wisa ye ku sînema, şano û hemû beşên din ên hunerê pê ve girêdayî ne. Wek ku nivîskarê Fransî Marcel Proust dibêje "Hemû huner dixwazin bigîhîjin heybeta muzîkê." Ji ber ku heybeta muzîkê gelekî girîng û bandor e. Çanda populîzmê civakê xistiye bin bandora xwe. Populîzm hunermendên civaka kurd bê qîmet dike. Di vê mijarê de lazim e em bi rihek netewî li hunera xwe derkevin. Ji sedî yek ku rihê muzîka kurdî bi wan re hebe, ew ê li muzîka kurdî guhdar bike û jê hez bike. Di vê mijarê de ji muzîka kurdî rev tune ye. Lê bes, ez dikarim bêjim civak, kom û komeleyên me jî îro ji bo tevahî hunera kurdî eleqedarbûna wan têr nabînim. Însan bi çanda populîzmê hatine têgihiştin û her tim berê xwe didin wî/wê kesên ku populer bûne. Lê dawiya populerbûnê nîne. Çanda populîzmê civakê xistiye bin bandora xwe. Populîzm hunermendên civaka kurd bê qîmet dike. Di vê mijarê de lazim e em bi rihek netewî li hunera xwe derkevin. Heger stran û muzîka kurdî tunebûna, dibe ku îro zimanê kurdî negihişta vê merheleyê. Bandor û hêza muzîka kurdî gelek piştevaniya zimanê kurdî dike. Heger muzîka kurdî tunebûya, ji aliyê ziman û wêjeyê ve dê qelsî derketa holê."…*MA*

## Mîhrîcana Zîlanê diyarî Campbellê hat kirin




Mîhrîcana Jinên Kurd a Zîlanê ew ê îsal di 6-7'ê Tîrmehê de li Londonê were lidarxistin.
Mîhrîcana Jinên Kurd a Zîlanê ya 15'emîn ew ê îsal di 6-7'ê Tîrmehê de li Londonê were lidarxistin.
Festîval ew ê bi şîara 'Parastina Efrînê, parastina şoreşa jinan e' were lidarxistin. Festîvala îsal diyarî şervana enternasyonalîst Hêlîn Qereçox (Anna Campbell) hate kirin, a ku di dema parastina Efrînê de şehîd bûbû.
Meclîsa Jinan a Roj ya ku Mîhrîcanê organîze dikin, daxuyaniyeke çapemeniyê.Di Mîhrîcanê de ew ê wekî her sal, îsal jî gelek çalakî hebin. Di Mîhrîcanê de ew ê panel, konser, nîşandana cilên neteweyî, nîşandana sînevîzyonê û govend hebe.
Di heman demê de ew ê standên xwarin û cil û bergan jî hebe.Di 6'ê Tîrmehê de ew ê li ser 'Berxwedana Jinan a li Efrînê û Hevgirtina Enternasyonal' panelek were lidarxistin. Fînala Mîhrîcanê jî di 7'ê Tîrmehê de ew ê bi konsera Nadîe Vîsser, Sûna Alan, Sevîm Aslan pêk were. Bavê Annayê Dîrk û birayê wê Adam Campbell jî ew ê tevlî bibin.
Jinên Kurd ên li Brîtanyayê dijîn wekî her sal, îsal jî rêxistinbûna xwe geştir dikin û bi wî awayî xwe ji festîvalê re amade dikin.

## Metran Îsa



Sîpan ŞÎNDA

Strana Kurdî, ji bo Kurdan ne tenê stran e. Aliyek yê dîroka Kurd û Kurdistanê di strana Kurdî de ye. Ji eşq û evînê bigire heya jiyana civakî, çand, dîrok, têkiliyên di nava civaka Kurdan de, jiyana civakê a rojane, rolên jin û mêran, têkiliyên di nava ol û netewên cida de, heta çînên (caste) di nava civakê de ji mirov dikare di nava strana Kurdî bibîne. Hege mirov guhdarvanekî baş be, dema mirov guhdarî strana Kurdî dike ev yeka henê bi awayekî eşkere derdikeve holê. Ji xwe ji ber wê ye strana Kurdî evqas xurte û bi sed salan bê nivîsandin û tomarkirin xwe daye jiyandin. Yek ji van stranên rayên wê kûr û xurt û heya îro ji tê gotin û guhdarkirin strana Metran Isa ye. Gelik stranên bi vî hawî hatine gotin hene. Mînak Kirîvê, Emê Gozê, Derwêşê Evdî, Ferhoyê Izêr Axa, Seîd Axa...
Emê qala strana Metran Isa û çîroka wê bikin. Ev stran ji aliyê gelik kesan ve hatiye gotin. Mînak Mihemed Arif Cizîrî, Isa Berwarî, Hesen Cizîrî, Miradê Kinê ji kevin de ev stran gotine û bi dengê wan hatiye tomarkirin. Piştî wan ji gelik dengbêjan ev strana bi nav û deng strane. Mesela vê stranê, li gor min ji mezinan bihîstî û ji stranê guhdarî kirî ezê ji were bêjim. Dibêjin Mêrema Fileh rojekê diçe sûka Wanê. Eliyê Qolaxa li sûkê dibîne û dil dikevin hev. Elî bi xwe hingê li Wanê Qolaxayê leskeriye. Mêrem ji keça axayê Ermeniyên Wanê Silêman Axa ye. Eliyê Qolaxa û Mêrema Fileh hij hev dikin. Nav û dengê bedewiya Mêremê li Wanê de hebûye. Waliyê Wanê ji Mêrem dîtiye û daxwaza Mêremê ji bavê wê dike. Bavê wê dibêje bila ser çavan, ezê keça xwe bidim te lêbelê dînê me ne yeke ji ber wê çênabe. Piştî wê Eliyê Qolaxa Mêrema Fileh direvîne û pêşiyê dibe mala Osman Paşa. Bes Osman Paşa dibêje ez nikarim we xwedî bikim û ji mala min herin, min barê Silêman Axa nîne. Piştî vê gotinê, Mêrem dibêje Elî, di Dêra Axtemarê de Metranekî me heye dibêjin Metran Isa. Were em biçin li cem wî. Elî dibêje, em ji filehan direvin tu dibêjî em biçin li cem Metran Isa. Mêrem dibêje tu bi ya min bike û em biçin biceribînin. Radibin riya xwe digirin û diçin Dêra Axtemarê. Axtemar bi xwe giraveke di nava Behra Wanê de ye. Divê mirov bi kelekan biçe wir. Dema diçin ba Metran Isa, Elî mesela xwe jêre dibêje. Piştî vê bûyerê stran hatiye gotin.

......Elî dibêje Metrano îro sibeye sibe zû ye, tu ji xewa şirîn rabe, siba te bi xêr û bêreMinê tiştek kiriye ne li gor dînê filetiyeMinê Mêrema fileh, destgirtiya waliyê Wanê revandiye
Mane tu wê rabe mehra min û Mêremê bike li ser dînê Isa yê Nûraniye
Hege tu qebûl bikî, hege tu qebûl nakî mehra min û Mêrema fileh bike li ser dînê Islamiye
Delîl delîl, şertê min û vî Metranî
Metran serê xwe ji xewa şirîn rakirî gotî Eliyê Qolaxa weha nakim lo lo weha nakim
Ezê şerîetê lo lo betal nakim
Ezê dinê Mihemed li hewşa Dêrê ji bo xatirê jinikek fileh lo lo rezîl nakim
Heçî qesta Dêra Axtemarê bike, minê sond xwarî li Isayê Nûranî, bê kuştina xwe keskê bê mirad lo lo bazar nakim
Ezê îro qewlê resûlê xwidê, bi şer'a Nebî Mihemedî, Mêrema Fileh li Eliyê Qolaxayê Wanê markim
Wezê sebe te ji lo lo serî betal nakim....

# Xwendekarên Efrînê li Zanîngeha Rojava ne

***Piştî ku dewleta tirk Efrîn dagir kir, xwendina bi hezaran xwendekarên dibistan, peymangeh û zanîngeha Efrînê di nîvî de ma. Zanîngeha Rojava ya ku hinek xwendekarên Zanîngeha Efrînê yên ku beşê wan di zanîngehê de heye di nava fakulteyên xwe de bi cih kirin.***



Zanîngeha Rojava ya ku hinek xwendekarên Zanîngeha Efrînê yên ku beşê wan di zanîngehê de heye di nava fakulteyên xwe de bi cih kirin. Ji rêveberên Zanîngeha Rojava Merwa Elyas bang li xwendekarên Efrînê kir û got: "Xwendekarên ku beşên wan di Zanîngeha Rojava de tune ye jî bila serlêdana beşên din bikin, da ku bê xwendin nemînin."

Piştî ku dewleta tirk a dagirker di 20'ê çileyê de êrîşên dagirkerî birin ser Efrînê, xwendina bi hezaran xwendekarên dibistan, peymangeh û zanîngeha Efrînê di nîvî de ma. Yek ji van saziyên perwerdeyê jî Zanîngeha Efrînê ye.

Zanîngeha Efrînê, yekem zanîngeh e ku li Rojava di sala 2015'an de hatiye vekirin. Di zanîngehê de 4 fakulte û 6 beş hene. Ev beş tenduristî, wêje, ragihandin, endezyariya çandiniyê, endezyariya mekanîk û beşa aboriyê ne. Bi giştî nêzî 850 xwendekaran lê dixwend.

Piştî ku Zanîngeha Efrînê ji aliyê dewleta tirk a dagirker û çeteyên wê ve hat girtin, perwerdeya xwendekarên zanîngehê di nîvî de ma. Zanîngeha Rojava ya ku li Herêma Cizîrê bajarê Qamişlo hatiye vekirin, ji bo xwedîderketina li xwendekarên Efrînê, kampanyayek di destpêka nîsanê de ji bo wergirtina xwendekarên Zanîngeha Efrînê da destpêkirin. Komîteyeke qeydkirina xwendekaran li Şehbayê û di heman demê de komîteyek jî li Zanîngeha Rojava jî hat avakirin. Xwendekarên Efrînê yên ku beşên wan li Zanîngeha Rojava hene, serlêdana Zanîngeha Rojava kir. Zanîngeha Rojava di sala 2016'an de hat vekirin. Zanîngeha Rojava ji 6 fakulteyan; çandinî, wêjeya kurdî, petrol û petrokîmya, hunerên bedew, jineolojî û zanistên perwerdeyê pêk tê. Bi giştî 720 xwendekar li Zanîngeha Rojava dixwînin.

Zanîngeha Rojava ji bo xwendekarên Efrînê di fakulteyan cih veqetandin. Di heman demê de cihên mayînê ji bo wan amede kirin. Xwendekarên Efrînê yên ku beşên wan di Zanîngeha Rojava de tune ne, dîsa zivirîn herêma Şehbayê. Xwendekarên ku beşên wan di zanîngehê de heyî niha li Qamişlo dixwînin. Bi giştî 15 xwenekarên Efrînê li Qamişlo dixwînin. Ji 15 kesan 13 xwendekar di Falkulteya Wêjeya Kurdî û 2 xwendekar jî di Fakulteya Endezyariya Çandiniyê de dixwînin.

Endama Rêveberiya Fakulteya Wêjeya Kurdî Merwa Elyas diyar kir ku ew wek rêveberiya Zanîngeha Rojava xemgîn in ku hemû beşên li Zanîngeha Efrînê hebûn, niha di halê hazir de li Zanîngeha Rojava tune ne. Merwa Elyas da zanîn ku niha derfetên wan ên vekirina fakulteyên nû tune ye, lê di demên pêş de ew ê hewl bidin fakulteyên nû vekin.

Merwa bang li xwendekarên Efrînê kir ku tu carî hêviya xwe neşikînin û wiha got: "Xwendekarên ku beşên wan di Zanîngeha Rojava de tune ne jî, bila serlêdana beşên din bikin da ku bê xwendin nemînin."…*ANHA*

## Alîkarî li gundên rizgarkirî tê belavkirn



Meclîsa Gel a navçeya Şedadê alîkarî li gundên nû ji çeteyên DAIŞ'ê hatine rizgarkirin belav dike. Belavkirin ji bajaroka Dişîşayê destpê kir.

Meclîsa Gel a navçeya Şedadê bi hevkariya Meclîs Kantonê Hesekê alîkariyan li gundên di çarçoveya qonaxa duyemîn a Pêngava Bagera Cizîrê de rizgar hatine rizgarkirin belava dike. Belavkirina alîkariyan ku ji madeyên xwarinê pêk tê ji bajaroka Dişîşayê dest pêk kir.

Meclîsê 4 hezar û 231 pakêtên xwarinê belav kirine.

Li kêleka alîkariyan jî jî belavokên hişyariya ji mayînên çeteyan hatin belavkirin, tê de bang li welatiyan hate kirin ku heger tiştên bi guman bibînin aliyên têkildarî agahdar bikin…*ANHA*

## Yekem kargeh li Reqayê dikeve xizmetê



Li Reqayê, piştî rizgarkirinê ji çeteyên DAIŞ'ê, yekemîn kargeh hate vekirin.

Li bajarê Reqaya rizgarkirî, bi armanca geşkirina aboriyê, yekemîn kargeh hate vekirin. Kargeha çêkirina her cûre leçer hate vekirin. Kargeh ji çend beş û alavan pêk tê. Kargeh hemî cureyên leçeran çêdike û her wiha ruxsetiya firotina berheman girtiye.

Xwediyê kargehê Mihemed El-Hesen got: "Em amadekariya berfirehkirina berheman dikin û bang li Meclîsa Sivîl a Reqyê dikim ku ji vegera xwediyên kargehan hêsan bikin da ku vegerin warên xwe û jiyanê ji nû ve geş bikin."

## Perwerde li Akadmiya Jinên Sûriyê dewam dike



Bi dirûşmeya "Jina azad bingeha civaka azad e" Akademiya Jinên Sûriyê li gundê Tişrîn a bakurê Reqayê 4'emîn dewreya perwerdeyê vekir.

Dewreya pewerdeyê bi navê şehîd Şîlan Efrîn hat vekirin. 24 endamên saziyên sivîl û leşkerî yên Kantona Cizîrê tevlî dewreyê bûn. Di dewreya ku wê 25 rojan berdewam bike de wê waneyên fikirî, çandî û siyasî werin dayîn.

Semîre Ebulah ya ku ji Reqayê ye û tevlî dewreyê bûye anî ziman ku ew bi armanca naskirina girîngî û rola jin di avakirina civakê de û xurtkirina tevlîbûna jinê ji hemû aliyên jiyanê re tevlî dewreyê bûye.

Endamê Rêveber a Akademiya Meclîsa Jinên Sûriyê Wefei El-Hisên jî da zanîn ku bi armanca rizgarkirina jinê ji hişmendiya baviksalarî ku di dema DAIŞ'ê lê hatibû ferzkirin û ji bo bidestxistina azadî û mafên xwe ji bo jiyaneke hevbeş bi zilam re, wê vekirina dewreyên perwerdeyê berdewam bin.





Amedekarî

Sîpan CAN

Ev demeke encam û biryarên konferansa rizgarkirina Efrînê di rojevê de ye. Gelek derdor, çapemenî behsa vê mijarê dikin. Ka bê çi tê gotin, çi tê amedekirin û wê çawa zemîna xebetekî ango hemleyekî rizgarkirina xaka Efrînê ji çete û dagirkeran bê destpêkirin.

Li gorî daneyên geopolîtîk yên li Sûriyê û herêmê xuya dibe wê bi hêsanî ev xebat neçe serî, taybet piştî ku dîsa Erdoganê faşîst bû serokkomar, pazara ku wî bi Rûsiyayê kir û di encamê de Efrîn dagirkir hîn jî berdewam e û her kes ji wan berjewndiyên xwe diparêzin.

Eger e bizivirin flaşbacka êrîşên li Efrînê bûne ev tişt derdikevin holê. Êrîşa bûyî ne tenê destê Tirkiyê tê de hebû. Bi gîştî kompoyek gerdûnî bû. Cîhana bêdeng di tu dîrokan de ewqas hovîtî û heqareta li gelekî tê kirin temaşe nekiriye. Lewra tifaqa qirkirinê, bêdengî, destwerdan, ji her milî de ji nedîtî ve hêşt sucên Tirkiyê li Efrîn zêde bibin û asta komkujiyên xwe bilind bike. her wiha bikaranîna teknlojiya herî serkeftî di duniyayê de. Ji xwe her dewletekî cîhanê ji aliyê xwe ve destek resterast bi kerbûna xwe dan çete û faşîstan. Bi gotinek din, dewleta TC, hêzên hegemon, di serî de Rûsiya, yekîtiya Ewropa û Amerîka hemû şirîkên wêrankirina Efrînê ne. Hemû di nava hevsengiyekê de û bi yek konseptê çavên xwe li Efrînê girtin. Hemû faktor û dengeyên siyasî, leşkerî, lojistî, diplomasî ketin berjewendiya dîktatorê demê Erdogan û êrîşên xwe mubah û rewakirin. Yanî hemû derfetên ku cîhanê ji Tirkiyê re avakirin di amedekariyên xwe de cih dayê û hemle destpêkir.

Niha, di van rojên nazik yên herêm têre berbas dibe. taybet li aliyê Efrîn Û Şehbayê ji bo rizgarkirina Efrînê konferans, civîn, plansazî ji bo xortkirina zemîna amedekariyên hemleyekî tên kirin. Li gorî şîroveyên di destpêkê me behsê kirine, mirov dibîne ku wê hemleyek bi vî rengî ne hêsan be. her çiqasî, hêzên li Rojava û Bakurê Sûriyê li dijî DAIŞ, ji Kobanê de bigire ta niha Dêra Zorê şerkirin; lê wê vê carê li Efrînê ne bi vê hêsaniyê be. divê bê zanîn ku dengeyên siyasî û bazarên li ser Efrînê hatine kirin, heyanî têk neçin û berjwendiyên hemû hêzên komploger li hev û din nekevin wê rewş zû bi zû neyê guhertin. Di serî de, ji bo balkişandina raya gîştî diplomasiyek bi îqnaa bê meşandin, ango çi belgeyên ku binpêkirinên Tirkiyê li Efrînê kirine ji cîhanê re bê aşkerikirin û komkujî wek sucên şer bên naskirin. Ya din, li gorî yasayên navnetewî divê dewleta tirk wek dewşetek dagirke bê naskirin, Efrîn wek bajerk Sûriye û divê derhal dagirkerî jê derkeve, her wiha hemû deverên mîna Cerblus, Ezaz û Babê jî. Ji aliyek din ve divê mijara Efrînê wekî erkekekî netewî ji bo hemû kurdan bibe şansek ku hemû hêzên kurdî xwe li dorê bigirin û ji bo kongreyekî netewî di zûtirîn dem de bê lidarxistin. Her wiha ya girîngtir û ev tişt jî tê xuykirin, bîr û baweriya gelê Efrînê ji bo vegera ser axa xwe hêza herî xorte, mayîna wan li Şehbayê û berxwedaniya wan wê veger û rizgarkirinê misoger bike.



# Dewleta tirk dixwaze aramiya li Minbicê têk bibe

***Endama Meclîsa Jinê ya Minbicê Hena Şerîf da zanîn ku niha li Minbicê jiyanek demokratîk heye û gel bajarê xwe bi rêve dibe. Hena wiha got, "Niha rewşek aram û wekhev bi têkoşîna QSD'ê hat avakirin lewma pêdivî bi Tirkiyê tuneye. Dewleta Tirk dixwaze aramiya li Minbicê têk bibe. Em dewleta tirk li ser axa Minbicê naxwazin."***



Hena Şerîf derbarê hevdîtinên Amerîka û Tirkiyê yên li ser Minbicê diyar kir ku ew naxwazin Tirkiye têkeve Minbicê û got: "Em dikarin xwe bi rê ve bibin. Hewcedarî bi pergala desthildatdarî û dagirkirinê tuneye."

Endama Meclîsa Jinê ya Minbicê Hena Şerîf derbarê hevdîtinên Amerîkayê û Tirkiyê yên li Minbicê da zanîn ku niha li Minbicê jiyanek demokratîk heye û gel bajarê xwe bi rêve dibe û got: "Niha ji ber ku rewşek aram û wekhev bi têkoşîna QSD'ê hat avakirin loma pêdivî bi Tirkiyê tuneye. Em dewleta tirk li ser axa Minbicê naxwazin."Hena Şerîf da zanîn ku Tirkiyê çav berdaye aramiya Minbicê û got: "Dewleta tirk dixwaze alozî, êrîş û dagirkirina ku li Efrînê kir, li Minbicê jî bike. Ji demokrasiyek ku li ser pergala wekheviyê hatiye avakirin heye li Minbicê loma hewce nake ku dewleta tirk û Amerîka li ser Minbicê li hev bikin."

Hena bi lêv kir ku ew dev ji Minbicê bernadin û got: "Dê gelê Minbicê destûrê nede ku kes derbasî bajarê Minbicê bibe. Jixwe pergala Minbicê ya ku hatiye avakirin hemû gel di bin sîwana xwe de kom kiriye û cudatiyê naxe nav wan. Heger dewleta tirk têkeve Minbicê dê aramiya gel xera bibe. Loma em desthilatdariyê qebûl nakin."Hena Şerîf da zanîn ku ew ê ji bo Minbicê heta dawî li ber xwe bidin û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Erdogan dixwaze zihniyet û dewleta Osmaniyan li Minbicê ava bike. Lê kesekî xêr ji pergala Osmaniyan nedîtiye ku em bibînin. Em ê wekî gelê Minbicê bi dilekî yekpar axa xwe biparêzin."…*JINNEWS*

## Amedekariyên li darxistina Konferansa Kongra Star

**Melek DEMÎRTAŞ**

Ji destpêka avakirina Kongreya Star, heye roja îro jin gelek destkeftî bi dest xistin, her wiha gele çalakî ji bo piştgirtiya jinê hatin orgenîze kirin. Jin bi pêşengitî cihê xwe di hemû qadên jiyanê de girt. Konferans her du salan carek ji bo nirxanidna xebatê tê li darxistin. Lê di 6.Konferansa Kongreya Star de, dê rêxistin û makanîzmeya xebat li gorî Fedraliya Bakurê Sûrî bê guhertin."

**LÎ GORÎ SÎSTEMA NÛ XWE BI RÊIXSTİN BİKİN**

Têkîldarê amedekariyên Kongerê û çawaniya makanîzmeya wê Rêvebira Kongra Star a Herêma Cizîrê Mîdiya Mehemûd ev agahî dan: Ji bo amedekirin û niraxandina xebatê Kongrê yê du salan, di 26'ê Hizîranê de li avahiya Kongreyê civîn hate li darxistin.

Û wiha dewam kir: "Di nirxandinê de taybet ser xebatê kongra Star li Efrînê, rêxistin kirina jin di komîn û civakê, taybet di rewşa şer de xwedî rolek girîne bû. Her wiha di çarçoveya pêşxistina xebat û nirxandina endaman jî, biryar hate girtin ku makanîzmeya xebatên xwe yê kevin bi guherin û li gurî sîstema Fedraliya Bakurê Sûriyê bi rêxstin bikin."

**ARMANC ÇALAKİRİNA JİNÊN CİWAN**

Mîdya dazanîn ku wê komîteya perwerdê bi Jineolojî re qordîne bikin. Û wiha got: "Di navbera 15 rojan de pêwîste makanîzmeya xebat li Kobanê, Şehba, Efrîn û Cizîrê li gorî sîstema bajarok, herêm û kanton biguherin. Ji bo wê li seran serê Herêma Cizîrê civîn têne li darxistin, da ku em tevlîbûna jinên ciwan di nav Kongrê de xurt bikin û çalak bikin. Armanc jê pêşxistin û rêxstinkirina civakê ser bingeha exlaq û polîtîk."

**LÎ 19 BAJAROK Û 47 HERÊM CİVÎN LÎ DABİKEVİN**

Mîdya diyar kir ku Komîta amedaekar ji 14 kesan hatin avakirin û wiha pêde çû: "Ev komîte amedekariya rêzîkname, perspektîf û civînan li darbixe. Ku 13 kes di bajarok de cih dgrin Berdev û du alîkar, her wiha 10 komîte. Di 30'ê Hezîranê de li ser asta Herêmê li herdu Kantonan Qamişlo û Heskê civîn li dar bikeve, ku heya 10 Tîrmehê dê li 19 Bajarokan civîn bêne li darxistin. Her wiha dê ji 20 Tîrmehê li 47 Herêma jî heya dawiya mehê civîn bi dawî bibin."

**HEMÛ JİN TEVLÎ PERGALA NÛ BİN**

Rêvebira Kongra Star a Herêma Cizîrê Mîdiya Mehemûd da zanîn ku wê di 25'ê Tîrmehê de Konferans li Kantona Heskê û 28'ê mehê li Kantona Qamişlo bê li darxistin. Û wiha bi dawî kir: "Ji bo pêşxistin û rêistinkirina civakê, bang li hemû jinan dikim ku di pergala nû ya Kongra Star de beşdar bibin."



## Bi hezaran jin li ser rêya Zîlanê ne



Jinên Kobanê bi boneya salvegera çalakiya fedayî ya gerîlaya PKK'ê Zîlan diyar kirin ku Zîlan bû sembola têkoşîna azadiyê ya jinan.

Gerîlaya PKK'ê Zeyneb Kinaci bi navê xwe yê tê nasîn Zîlan di 30'yê Hezîrana sala 1996'an li dijî êrîşên li ser gelê Kurd û rêberê Gelê Kurd ku dihatin pêş xistin li Dêrsimê bi çalakiyeke fedayî bersiv da.

Têkildarî salvegera çalakiya Zîlanê jinên Kobanê diyar kirin ku ew ê timî li ser şopa Zîlanê bimeşin û têkoşîna azadiyê bidin.

Endama Kongreya Star Felek Yusif diyar kir ku ew ê her li ser xeta Zîlanan doza xwe bimeşînin û wiha got: "Em hêza xwe ji têkoşîna doza Zîlanan distînin û em xwe bi rêxistin dikin. Di bin sîwana têkoşîna me de bi salan e ku hemû jin cihê xwe digirin û ji bo siberojek ronî berxwe didin."

Dayika Medîne Elî jî yek ji wan jinan e ku navê zaroka xwe kir Zîlan. Medîneyê got: "Dema ku me bihîst Zîlan şehîd ketiye û me peyama wê xwend em gelekî pê bandor bûn. Me bi hêviya ku zaroka me jî bibe şopdara têkoşîna doza Zîlanan lewre jî me navê zaroka xwe Zîlan danî."

Keça Medîneyê, Zîlan Hemo da zanîn ku ew gelek şanaze ku navê Zîlanê lê hatiye kirin û got: "Ji ber ku navê Zîlan li min hat kirin, ev bû sedem ku ez hestên cuda bijîm û baweriya min zêdetir bû. Diya min bi hêviya şopandina doza Zîlanê ev nav li min kir. Ez jî îro hewl didim ku vê hêviya diya xwe pêk bînim."

Endama Yekîtiya Jinên Ciwan (YJC) Elefterya Harûn anî ziman ku Zîlan destpêkirina dîrokek nû ye û got: "Çalakiya Zîlanê mînakek girîng e ku mirov sûdê ji wêrektiya wê bigire. Bi çalakiya fedaî ya Zîlanê me hêza xwe û sekna xwe nîşanî cîhanê da. Di heman demê de Zîlanê bi vê çalakiya xwe bersiv da pergala faşîst. Em ê jî di heman rêyê de têkoşîna xwe bidomînin.

Şervana Yekîneya Parastina Jin (YPJ) Zîlan Dêrsim bi eslê xwe ji Efrînê ye. Zîlanê hestên hilgirtina navê Zîlanê wiha anî ziman: "Ez gelekî di bin bandora hêz û vîna Zîlanê de mam. Lewma ji bo têkoşînê min ew mînak girt û ez beşdarî nava refên berxwedanê bûm. Min xwest ku ez layiqî navê wê bim û heta dawî şopdarê rêya wê bim. Di berxwedana serdemê ya Efrînê de jî li ser şopa Zîlanan me li ber xwe dan û Avesta û Barîndi rêya Zîlanê de bûn sembolên têkoşîna azadiyê."…*Berçem CÛDÎ*

## Zîlan li Amûdê hate bîranîn

Tekoşera Azadiyê Zeyneb Kinaci (Zîlan) ku pêş 22 salan li hemberî zulma dewleta Tirk û komploya li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan çalakiyeke fedayî li dijî artêşa Tirk lidar xistibû, ji aliyê sedan şêniyên herêma Cizîrê ve hate bîranînMerasîmê bîranînê li hola Beylesan a navçeya Amûdê ji aliyê Kongra Star û Yekîtiya Jinên Ciwan ve hate organîzekirin. Bi sedan şêniyên herêma Cizîrê beşdarî merasîmê bûn.Endama rêveber a Kogra Star Mizgîn Ehmed axivî û got: "Şehîd Zîlan ji bo azadiya hemû jin û gelên bindest û li hember kiryarên dagirkeriya Tirk li dijî gelê Kurd e çalakiya fedayî kir".Mizgîn destnîşan kir ku, ji bo avakirina welatekî azad pêwîstî bi fedakariyê heye û wiha axivî, "Berxwedan û fedakarî heye roja me ya îro berdewam e. Şehîd Avesta li ser rêya şehîd Zîlan meşiya û canê xwe kir agir û di nav dagirkerên Tirk û çeteyên wê de xwe teqand".Endama rêveber a Yekîtiya Jinên Ciwan Jînda Qamişlo jî axivî û diyar kir ku têkoşer Zîlan bi çalakiya xwe ya fedaîyane komploya ku li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan vala derxist û bû sembola jinên azadiyê.



Komîn
-2-

Binevş SARYA

Wekî kû me di beşa bihûrî da jî anî bû ziman hebuna komînan, hebuna bi hevra bûyîna civakan û mirovan e. Ji destpêka mirovahiyê ve di civakê de jiyana komînal hebu ye. Her ku dem bihûrî ye û sîstema şaman, rahîb û qiral pêşketî ye jiyana komînal jî ber bi tunebûnê ve çû ye. Dema kû jiyan kete destê şaman û qiralan, di wê jiyanê de destihiladarî û takekesî ferd parêzî li pêş ket. Dem kû ferd parêzî û destihiladarî li pêş dikeve bê guman wê civak an jî kesên ku ji destihiladaryê aciz serê xwe ji hebûna qiralan re netewînin. Li beramberî ferdiparstinê civakan û pêşengên civakan car din tekoşîna jiyana komînal bi awayekî kû bedelê wê gelek giran be jî têkoşîna bi hevrebûyînê dane û ji boyî carek din bikaribin bi awayek hevbeş bijîn. Şerê jiyana azad dane meşandin. Ev tekoşîna jiyana komînal heta roja îro jî hîn bi awayek xurt li beranberî sîstema kapîtalîzmê didome.

Piştî ku aqilê mêr ê baviksalarî li pêş dikeve û civak ber bi yek dengî û yek rengiyê ve diçe. Di civakê de rihê têkoşîna ji bo jiyana komîn jî her kû diçe xurtir dibe û ji bo hebûna civakan şerê jiyana rast tê dayîn. Ger îro jî em dikarin behsa hebuna komîn û komînal buyînê bikin bê guman em deyn darê dîroka xwe ne. Aqilê dîrokî nahêle kû mirov ji kokên xwe ên sereke qut bibe. Di dîrokê de care yekem ji milê Mazdek ve şerê jiyanek komînal hatiye meşandin. Ji bo jiyanek komînal were jiyîn Mazdek li beranberî destihiladariya Sasaniyan serî hildaye û têkoşîna jiyanek bi hevra bûnê daye. Mazdek kû bi eslê xwe ji herêma Rojhilatê Kurdistanê ye lê belê nayê zanîn kû kengê ji dayîk buye. (Li gorî lêkolînên diroki ku di salên 499'an de hatiye qetilkirin.) bê guman beriya wan deman jî têkoşîna ji bo jiyana komînal hatiye dayîn, lê li gorî dîrokên nivîskî dîroka berbiçav ji vî demî ve hatiye nivîsandin. Mazdek ku îlhama ramanên xwe ji çanda Zerduştî girtiye ku di çanda Zerdûştiyan da jî rêgezên jiyana komînal bûyînê zagonên bingehînin.

Di têkoşîna Mazdek, Hûrrem û Babek de jî herî zêde ji bo bi hevrebûyîna civakan, li dijî serdestiya Sasaniyan şerê komînal buyînê dane meşandin. Ji zagonên wana ên bingehîn kû çend xalên di nava rûpelên dîrokê de hîna bi awayek zelal tên xwendin wihane.

1. Ji bo bi hev re mal û milk bên parvekirin têkoşîn kirin.
2. Wekheviya di navbera jin û mêrda
3. Li di jî serdestî û destihiladarî ya li ser gelan têkoşîn kirin

Ev xalên sereke ên kû Mazdek, Hûrrem û Babek ji bo wê têkoşîn dane meşandin. Dema kû mirov li dîrokê temaşe dike mirov baştir dibîne kû ka çend bedelên giran biha ji bo jiyana komînal hatine dayîn. Têkoşîna ji bo jiyanek bi hev re bûyînê piştî Mazdekan jî bi pêşngtiya tevgera Îsmaîliyan û Hisên Sabbah hatiye domandin. Tevgera Îsmaîliyan kû navê xwe ji neviyê H.Z Elî kurê mele El Sadiq Îsmaîl girti ye. Tevgera Îsmaîliyan herî zêde bi berxwedana Hesen Sabbah, navê xwe bi Cîhanê daye bihîstin. Hesen Sabah weke Şêxê Çiyan jî tê naskirin. Wisan tê zanîn ku Hesen Sabbah di sedsala 11. de jiyan kiriye. Tevgera Îsmaîliyan ji bo jiyanek komînal li qeleya Alamut kû dikeve rêze çiyayên Elburzê ên herêma Anatolya yê. Ev Çiyane gelek asêne û gelek caran artêşan êrîş birine ser nekarîne bidest bixin . Li Qeleyê destpêkê derfetên jiyanek bi ewle û baş ji bo gelê wêderê hatiye avakirin. Têkoşîna li vir li dijî destihladariya Ebasiyan hatiye meşandin…

# Wê projeya demokratîk bi ser kev e

***Hevseroka Meclisa Sûriya Demokratîk MSD'ê Îlham Ehmed di Kongreya Damezirîner a Meclisa Ciwanên Reqayê de axivî û diyar kir ku ew amade ne ji bo danîna destûra nû ya Sûriyê bi rêjîma Sûriyê re danûstandinan bikin. Îlham wiha got, "Tevî hemû hewldanên li dijî gelên Sûriyê jî wê projeya demokratîk bi ser bikeve."***

Ciwanên zana dikarin Sûriyeyê ber bi demokrasiyê ve bibin
Îlham Ehmed diyar kir ku ew amade ne der barê pêşeroja Sûriyeyê de bi rêjîma Sûriyeyê re danûstandinan bikin û li ser rola ciwanan jî got ku ciwanên birêxistinkirî dikarin Sûriyeyê ber bi demokrasiyê ve bibin.
Hevseroka Meclisa Sûriya Demokratîk MSD'ê Îlham Ehmed di Kongreya Damezirîner a Meclisa Ciwanên Reqayê de axivî û got ku ew amade ne ji bo danîna destûra nû ya Sûriyê bi rêjîma Sûriyê re danûstandinan bikin.
Îlham Ehmed di axaftina xwe de bal kişand ser şerê dijwar ku li Sûriyê pêk tê û wiha axivî: "Li Sûriyê şerên dijwar rûdidin. Ev şer di encama itîfaqa di navbera Amerîka û Rûsyayê de li dijî komên çekdar ên li Derayê pêk hatiye. Hin komên çekdar li hin herêman hebûna xwe ya leşkerî bi dawî kirin. Van koman qebûl kir ku biçin herêmên din ên Sûriyê. Ev di çarçoveya guhertina demografîk a li Sûriyê de pêk hatiye. Ew hewl didin herêmên taybet bi xwe ava bikin. Rewşa Iraqê jî li ber çavan e."
Îlham Ehmed di berdewama axaftina xwe de destnîşan kir ku tiştê di pratîkê de pêk tê kiryarên dewletên herêmê nîşan dide û wiha dewam kir: "Tiştê li herêmê pêk hat, helwesta siyasî ya herêmî ya li dijî gelê Sûriyê nîşan dide. Lewma em dibêjin ku tevî hemû hewldanên ku têne kirin wê projeya demokratîk bi ser bikeve."
Hevseroka MSD'ê Îlham Ehmed bi bîr xist ku gelek aliyan got ku projeya me Sûriyê parçe dike û got: "Em jî dibêjin ku yên Sûriyê parçe dikin ew dewletên herêmî yên kiryaran li dijî gelê Sûriyê pêk tînin. Tiştê niha li Derayê pêk tê jî vê yekê nîşan dide."
Têkildarî danûstandinên bi rêjîma Sûriyê re jî Îlham Ehmed wiha got: "Em amade ne derbarê pêşeroja Sûriyê de bi rejîma Sûriyê re danûstandinan bikin, da ku em destûra nû ya Sûriyê deynin. Em hewl didin hemû Sûriye demokratîk be û ne be ya yek neteweyê. Em ji bo vê yekê têkoşînê dikin. Îro em dibînin ku hin alî daxuyaniyan didin. Berê me gotiye em amade ne, lê ew alî ne amade ne. Em amade ne li ser destûra nû ya Sûriyê û bidawîkirina aloziya Sûriyê




danûstandinan bikin. Em aramiyê û ewlekariyê ji gelê xwe yê Sûriyê re dixwazin."
Hevseroka MSD'ê Îlham Ehmed di dawiya axaftina xwe de got bi ciwanên zana û birêxistinkirî ew dikarin Sûriyê ber bi bernameyeke demokratîk û azad ve bibin.

## Tirkiye li bakurê Sûriyê dagirker e

Hiqûqnasên kantona Girê Spî diyar kirin ku siyaseta Tirkiyê li hemberî Bakurê Sûriyê siyaseteke "dagirkeriyê" ye û hewl dide fitne û tevliheviyên mezhebî û etnîkî di nava pêkhateyên herêmê de derxîne. Hiqûqnasan piştrast kirin ku Tirkiye bi dagirkeriya xwe di axa Sûriyê de hemû pîvan û qanûnên navnetewî binpê dike.
Hiqûqnasên kantona Girê Spî ya herêma Firatê derbarê siyasetên Tirkiyê yên li herêmê nirxandin kirin.
Endamê Komîteya Lêpirsîn û Gilîkarî ya Dadgeha Gel Muslim Mihemed diyar kir ku armanc siyaseta Tirkiyê li Bakurê Sûriyê "dagirkerî" ye û bajarê Efrînê jî nîşana vê yekê ye. Mihemed got, "Tirkiye hewl dide Minbicê jî dagir bike û Tirkiye hewl dide fitne û tevliheviyên mezhebî û etnîkî di nava pêkhateyên herêmê de derxîne.
Girêdayî gefên dawî yên Tirkiyê li dijî Minbicê Mihemed got: "bajarê Minbicê mînaka biratî û jiyana hevbeş e. Welatiyên Minbicê bi xwe karûbarên xwe yên sivîl û leşkerî didin meşandin. Destwerdana Tirkiyê di karûbarên Sûriyê de qanûn û pîvanên navnetewî binpê dike û rêzdariyê ji sînorên dewletên cîran re nagire. Biratiya gelan û jiyana hevbeş li Minbicê ne li gorî berjewendiyên Tirkiyê ye. "

### GEFÊN AMADEKARIYA DAGIRKIRINÊ YE

Dadger û Endamê Desteya Edaleta Civakî Mihemed Îsmaîl jî girêdayî heman mijarê axivî û diyar kir ku gefên Tirkiyê û siyasetên wê li hherêmê amadekariya dagirkeriyeke nû li herêmê ye û got: "Ala Tirkiyê ku li ser axa Sûriyê hatiye bilindkirin nîşana siyaseta dagirkeriyê ye û cîhan li hember vê dagirkeriyê bêdeng e."
Îsmaîl got: "Divê em weke gelê Sûriyê hevgirtina xwe xurt bikin û ji bo derxistina dagirkeriyê tê bikoşin."







Dadgerê Dadgeha Gel a Girê Spî Casim Îsmaîl jî diyar kir ku Erdogan qanûn û pîvnanên navnetewî binpê dike û ji bo dagirkirina axa Sûriyê çeteyan bikartîne.
Îsmaîl wiha got:
"Tirkiye hewl dide aramî û ewlehiya li herêmê têk bibe. Em weke pêkhateyên herêm ti carî dagirkeriyê qebûl nakin."…*ANHA*

## Zîlan trajediya Kurdan ji hev xist



Alî Haydar Kaytan diyar kir ku çalakiya Zîlan (Zeynep Kinaci) çalakiyeke jiyana nemir e.
Çalakiya gerîlaya PKK'ê Zeynep Kinaci (Zîlan) ku 30'ê Hezîrana 1996'an li navenda Dersimê pêk anî, rê li ber serdemeke nû vekir. Endamê Konseya Serokatiya Giştî ya KCK'ê Alî Haydar Kaytan, di salvegera 22'an a çalakiya Zîlanê de ji MedyaHaber TV yê re axivî.
Kaytan di destpêka axaftina xwe de bi rêzdarî Zîlan bi bîr anî û işaret bi şerê giran ê salên 90'î yên li Kurdistanê kir.

### SALÊN QIRKIRINA FÎZÎKÎ

Kaytan bi bîr xist ku di salên 90'î de konsepteke înkar û tinekirinê li ser kar bû û got, "Weke dema Çîller-Agar-Gureş tê naskirin. Bi hezaran gundên Kurdan hatin şewitandin û xerakirin, Kurdistan ji gelek aliyan ve bê mirov hate hiştin û mirov dikarin bêjin ku salên qirkirina fîzîkî bû. Ya ku rê li ber çalakiya hevrê Zîlan vekir, konsepteke êrîşê ya li dijî Rêber Apo bû."
Kaytan destnîşan kir ku wê wextê dihate xwestin ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji aliyê fîzîkî ve ji holê were rakirin û got, "6'ê Gulana 1996'an bi wesayiteke bombebarkirî êrîş hate kirin. Bi tonan teqemenî li wesayitê bar kirin û pê êrîşî Rêber Apo kirin. Vê yekê bandoreke giran li ser gel bi taybetî li jinan kir. Di nava gel û kadroyan de bû sedema hêrseke mezin. Bêguman dihate xwestin ku bersiv ji vê yekê re bê dayin. Bi taybetî hevala Zîlan bersiva vê yekê da."

### RÊBAZEKE NÛ YA ÇALAKIYÊ BÛ

Alî Haydar Kaytan da xuyakirin ku Zîlan bi çalakiya xwe hişyarÎ da gel, hêzên gerîla û mîlîtanên PKK'ê û wiha dewam kir: "Ji bo bersiv ji êrîşên dijmin re bê dayin, ji aliyê taktîkî ve zor û zehmetî hebûn. Hevala Zîlan bi çalakiya xwe re ev rewşa xitimandî ji holê rakir."
Kaytan destnîşan kir ku çalakiyeke bi vê rêbazê, cara yekê bû ku di dîroka têkoşîna wan de dihate kirin û got, "Ji ber ku cara yekemîn di dîroka me ya têkoşînê de hate kirin, bandoreke giran li herkesî kir û her kes hejand."

### NAMEYÊN WÊ GELEKÎ WATEDAR BÛN

Kaytan bi dewamî got, "Dema ku min bihîst, ez li Kurdistanê bûm. Destpêkê kesî nedizanî bê çalakî ji aliyê kê ve hatiye kirin. Me bihîst ku çalakî ji aliyê hevrêyeke me ve hatiye kirin. Name hebûn. Wê bi rêya cîhazê bihata xwendin. Tevî hevalê Cemal (Mûrad Karayilan) me li nameyan guhdarî kir. Nameyên wê gelekî bi bandor bûn. Her gotineke xwe watedar bû. Encama kûrbûneke mezin bû. Ji Rêbertî, ji hevrêyên xwe û ji gel re name nivîsandibû."

### XWEST WATEYÊ BIDE JIYANÊ

Kaytan diyar kir ku çalakiya Zîlan divê tenê weke çalakiyeke fedayî neyê dîtin û destnîşan kir ku mijara bingehîn a Zîlan jî li ser disekinî, xwegihandina wateya jiyanê bû. Kaytan bi bîr xist ku Zîlan bi gotina "Dixwazim bibim xwediyê çalakiyeke mezin" ev daxwaza xwe bi rengekî vekirî raxist pêş çavan."
Kaytan anî ziman ku li Kurdistanê jiyaneke parçekirî, rastiya gelekî di nava qirkirina çandî de digevizî heye û wiha dewam kir: "Ev yek tê wateya parçebûna û ji hev xistina topyekûn a civakê. Yanî dihat wê wateyê ku bandor li mejî, li hemû hucreyên civakê bike û ji hev belav bike. Gelek mirovan, dibe ku me jî di nava şert û mercên wê wextê de destpêkê ev çalakî weke çalakiya întixarî bi nav kirin. Me bi zelalî dît ku ev yek şaşitiyeke mezin e. Ev yek çalakiya jiyaneke nemir e."
Kaytan işaret bi perspektîfa Zîlan a ji bo jiyanê kir û got, "Berê çalakiya xwe ne li mirinê ye. Dibêje, 'Îdîaya min a ji bo jiyanê gelekî mezin e' û bi vî rengî dest bi çalakiya xwe dike."

### ZÎLAN TRAJEDIYA KURDAN TÊK BIR

Endamê Konseya Serokatiya Giştî ya KCK'ê Alî Haydar Kaytan da zanîn ku çalakiya Zîlan di heman demê de trajediya Kurdan têk bir û herî dawî got, "Rastiyeke bi vî rengî hebû; mêrê Kurd ê teslîm hatiye girtin û li derveyî hemû çeperên desthilatdariyê hatiye hiştin û jinên ku desthilatdarî lê dihate ferzkirin. Heta ku ev rastî ji holê nehatibûya rakirin, trajediya kolekirina Kurdan nekarîbû bê têkbirin. Zîlan ev trajedî ji hev xist."

## AKP'ê di hilbijartinê de hîle û zext kir

Heyeta ku ji Ewropa ji bo şopandina hilbijartina çûbû Kurdistanê, daxuyaniyek da çapemeniyê û diyar kir ku AKP'ê di hilbijartinê de serî li hîle û zextan da.
Nûnerên partiyên siyasî yên ku di pêvajoya hilbijartinê de weke delegasyon çûbûn Kurdistanê diyar kirin ku li vir zext li wan hatiye kirin, li navenda Partiya Komunîst a Fransa daxuyaniyek da çapmeniyê. Di civînê de rêveberên HDP'yî jî amade bûn. Li ser navê delegasyonan di civînê de berdevka Keskan Sandra Regol, Berpirsê Têkiliyên Navneteweyî yê Partiya Komunîst ê Fransa Pascal Trre, Berdevkê Partiya Çep Danîelle Sîmonet û li ser navê HDP'ê Nûnerê Ewropa Eyûp Dorû amade bûn.

### BÊHIQÎQÛ Û SEXTEKARÎ

Eyûp Dorû: "ji bo hilbijartinê gelek delegasyon hatibûn herêmê. Gelek delegasyonên hatin herêmê zext lê hatin kirin û bêhiqûqî û sextekariya hate kirin, kirin bi belge. Tevî hemû hîle û sextekariyan partiya me 11,7 deng bi dest xist."

### EM HATIN DESTGÎRKIRIN

Pascal Torre: "Em li Agirî hatin destgîrkirin. Tevahî rojê destgîrkirî bûn. Endamên delegasyonê cuda cuda hatin lêpirsîn. Li wan gef hatin kirin. Di dema hilbijartinê de sindoqên li gundan birin navendan. Gundî rêya 80 km bi organîzasyona HDP'ê yan jî bi lingan karî biçin dengê xwe bikar bînin. Ji ber ku wesayîtên gund hatibûn rawestandin. Ji xwe sibehê hinek buro ji aliyê leşekeran ve hatibûn girtin. Dema ku me xwest em biçin van buroyan hatin destgîrkirin."

### HILBIJÊR DIBIN DORPÊÇA LEŞKERAN DE BÛN

Nûnera PCF Hulya Tûran: "Dema destgîrkirinê de em hemû seatekê hatin lêpirsinkirin. Fermandarê jendermeyan yê herêmê got ji ber pirtûka me ya bi sernavê 'stop Erdogan' ku berê hatibû derxsitin, ji ber sûcê 'heqerata li serokkomar' wê me bigrin. Piştre navê kurê min nîşan da û got wê ji bo wî jî pirsgirêk derbikevin û gef li min xwarin. Di nava rojê de 2 destgîrkirin çêbûn. Armanca wan ew bû ku ji bo em pêvojaya hilbijartinê ne şopînin me ji herêmê dûrbixin. Piştî vê pêvajoyê pêwîst bû piştevaniya bi hêzên demokrat yên Kurd û Tirkiyê re hê bêhtir bihata xurtkirin. Tevî hemû zextan derxistina HDP'ê ya 67 wekîlan gelek girîng e.".

### ME PÛSÛLAYÊN HATIBÛN AMADEKIRIN DÎT

Berdevka Keskan Sandra Regol: "Li pêşiya buroyên hilbijartinê leşker û polîs amade bûn. Piştre delegasyona me ragihand ku buro hatine girtin. Em li Pirsûsê bûn. Li vir pûsûlayên ku berê hatibûn amadekirin me dîtin. Ev vekirî dihate kirin. Armanca mudaxeleya li me kirin xwestin ku em van hîleyan nebînin. Dema ku sindoq hatin vekirin me dît ku çawa di tevna civakî de encamên hilbijartinê tên eyarkirin. Heta ku em li wir bûn û derketin li ser hemû deleqasyonan dorpêçek hebû."

### HEDEFA WAN HEMÛ TEPISANDINA HDP'Ê BÛ

Delegasyona Partiya Çepgir Danîelle Sîmonet: "Li Amedê me pêvajoya hilbijaritnê şopand. Yekîneyên leşkeran di pêvajoya hilbijartinê de aktîv bûn; li nava hemû buroyên hilbijartinê de cih girtin. Hemû armanca dewletê tepisandina HDP'ê bû."



# Diyalogên me bi rêjîmê re çênebûne

Navenda Têkiliyên Doplomasî ya TEV-DEM'ê diyar kir ku di navbera wan û rêjîma Sûriyê de ti danûstendin çê nebûne. TEV-DEM'ê got, "Danûstandinên bi armanca çareserî, aramî û ewleahiya Sûriyê bi her aliyekî Sûriyeyî re ne şaş e. Lê heta niha bi rêjîmê re hevdîtinên me pêk nehatine."

Navenda Têkiliyên Doplomasî ya TEV-DEM'ê got, "Îdîayên danûstandinên me bi rêjîma Sûriyê ne rast in. Danûstandinên bi armanca ewlehiya Sûriyê bi aliyên Sûrî re tiştekî ne şaş e. Lê em tekez dikin ku heta niha tu diyalogên fermî çênebûne.
Navenda Têkiliyên Doplomasî ya Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM'ê têkildarî îdîayên dibêjin di navbera wan û rêjîma Sûriyê de danûstandinên têne kirin daxuyanî da û destnîşan kir ku ev îdîa ji rastiya xwe dûr in.
Di daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Îdîayên ku belav bûne û dibêjin di navbera me û hikûmeta Şamê de diyalog têne kirin rastiya xwe nîne, heya niha ti diyalogên çênebûne. Siyaset û projeyên me yên çareserkirinê û diyalogan û pêkanîna projeya demokratîk diyar û eşkere ne. Heger ku têkilyên me bi ti aliyan re hebe wê gelê me pê zanibe." Gelê me ji bo xizmeta çareseriya niştimanî ya Sûriyê amade ye, diyalog bi ti aliyan re red nekiriye, lê dema ku durist û ciddî bin. Xebatên ji bo çareserî û aramiyê yên bi hemû aliyên Sûriyê re tiştekî ne şaş e û danûstandin xeteke rast e. Ya ku niha em diyar bikin ew e ku heya niha tu diyalogên fermî bi ti kesî re pêk nehatiye."

## Pêşengê şer fermandar Rizgar



Fermandariya Giştî ya YPG'ê bi daxuyaniyekê ragihand ku di pêngava duyem a Berxwedana Serdemê de fermandar Rizgar jî di nav de 6 şervanên wan bi rihekî fedayî heya guleya xwe ya dawî şer kirine û gihiştine şehadetê.
Di daxuyaniya Fermandariya Giştî ya YPG'ê de wiha hate gotin;
"3-4'ê Nisanê de hêzên dagirker yên Tirk û çeteyên girêdayê wê ku li navçeya Reco a Efrînê û çiyayê Hewar de bicîh bûbûn di navbera wan û komek hêzên me de şerek qewimîbû. Di vê şerî de gelek leşkerên Tirk û çeteyên wê hatibûn kuştin û hêzên dagirker bi awayekî zêde teknîk bikar anîbû. Di encama şerê dijwar de 6 hevalên me bi rihekî fedayî heya guleya xwe ya dawî şer kirine û gihiştine şehadetê.
Hevalê Rizgar bi rengekî çalak tevlî pêngava dûyem a Berxwedana Serdemê ya Efrînê bûbû. Hevalê Rizgar ji 2013'an ve di tekoşîna azadiya Rojavayê Kurdistanê de bi şerê xwe bi kurahiya welatparêziyê xwedî derketiye. Ew bi kedek pir mezin de mezin bûye, di vê şerê bê eman de hê di dema zarokatiya xwe de bûye şahid. Ew di şer de bûye fermandarek bi bandor û bûye xwedî seknekî efsanewî.
Fermandarê hûnera şer hevalê Rizgar bi cesareta mezin hertim bûye fermandarek mînak. Em wek hevalên wî, soza dewamkirina berxwedanê û serkeftina tekoşînê didin."

## Bila leşkerên tirk ji başûr derkevin



Meclîsa Xweseriya Demokratîk a Şengalê daxuyanî da û got: "Axa Başûrê Kurdistanê ji aliyê dewleta tirk ve hatiye dagirkirin. Divê demildest dewleta tirk leşkerên we paş ve bikşînin."
Meclîsa Xweseriya Demokratîk a Şengalê li Xanesora Şengalê daxuyanî da. Di daxuyaniyê de hat ragihandin ku gelê Başûr leşkerên tirk li se axa xwe naxwazin.
Daxuyanî ji aliyê Hevseroka Meclîsa Xweseriya Demokratîk a Şengalê Rîham Hico ve hat xwendin. Gelek endamên sazî û dezgehên Şengalê û gel jî di daxuyaniyê de cih girtin.
Di daxuyaniyê de hat gotin ku bêdenginya PDK'ê hêzê dide AKP'ê û wiha hat gotin: "Ev demek dirêje ku dewleta tirk di nav hewldanekê de ye ku Başûrê Kurdistanê dagir bike. Armanc ew e ku destkeftiyên gelê Kurd bê tunekirin. Di şexsê êrîşên li ser tevgera azadî dixwazin hemû gelê Kurd tune bikin. Dewleta tirk di bin sîwana bêdengiya PDK'ê de êrîşên xwe pêk tînin. Ev hewldana dagirkirina dewleta tirk ji bo me Êzidiyên Şengalê jî metirsiyakê ava dike. Ji bo pêşî li fermanên nû yên li ser Êzidiyan neyên dubarekirin divê dewleta tirk leşkerên xwe paşve bikişîne. Di heman demê de ev êrîşên dewleta tirk bandorê li ser hemû Iraqê dike ne tenê li ser Başûrê Kurdistanê. Loma divê hem Rêveberiya Iraqê hem jî ya Başûrê Kurdistanê helwestek zelal nîşan bidin. Em bang li hemû dewletên ku demokrasiyê diparêzin dikin ku li dijî vê dagirkirinê bêdeng nemînin."

## HDP wê bi rihê seferberiyê tevbigere



Berdevkê HDP'ê Ayhan Bîlgen işaret bi encamên ne rewa yên hilbijartinê kir û got, `tevî vê yekê jî divê mirov bê hêvî nebin.`Berdevkê HDP'ê Ayhan Bîlgen encamên hilbijartina zordar a 24'ê Hezîranê nirxand û destnîşan kir ku hem ji ber zextên hatin kirin, hem jî ji ber bikaranîna derfetên dewletê, hilbijartin ne rewa ye.Bîlgen bal kişand ser dek û dolabên di hilbijaritnê de hatin gerandin û destnîşan kir ku di hilbijartinê de qeymeqam û keyayan ji AKP û MHP'ê bêhtir ji bo wan xebitîn. Ayhan Bîlgen da xuyakirin ku li gel vê yekê jî derbasbûna HDP'ê ji benda hilbijartinê serketineke mezin e.
Berdevkê HDP'ê Ayhan Bîlgen got, "Têkoşîna demokrasiyê têkoşîneke ku dema mirov dikeve, careke din radibin ser xwe û dimeşin" û destnîşan kir ku divê ti carî bê hêvî nebin. Bîlgen bi bîr xist ku dîktator dema dikevin, nema dikarin ji şûna xwe rabin û yekser hildiweşin.Bîlgen diyar kir, pêwîste ders ji vê pêvajoyê bê dexistin û ew li pêşiya xwe binerin. Li ser polîtîkayên HDP'ê yên ji niha û pê ve bimeşîne Bîlgen got, "Li ser karên xwe yên ji niha û pê ve em ê plansaziyekê amade bikin."
Berdevkê HDP'ê Ayhan Bîlgen diyar kir ku dema ew li hevsengî û arîtmetîka li meclîsê dinêrin, dibînin ku li gel rîskên mezin, derfetan jî dide û got, "Ji bo coş û kelecana li kolanan derkete holê bê parastin, ji bo kesên ku cara yekemîn deng dane HDP'ê li ser zemîna têkoşînê bi HDP'ê re bimeşin, divê em bi xurtî bixebitin."Bîlgen destnîşan kir ku partiyên siyasî di serdemên zehmet de mezin dibin, xwe digihînin beşên nû yên civakî û got, "Girîng e HDP bi seferberiyeke nû ya rêxistinbûnê karibe barê giran ê vê serdemê hilgire û bi rengê seferberiyê tevbigere."

## Sadr, hêzên xwe yên leşkerî bêçek dike

Lîderê Şîa Muqteda Sadr, piştî serketina xwe ya hilbijartina Iraqê ya 12'ê Gulanê, biryar da ku komên girêdayî xwe yên di nav Heşdî Şebî de bêçek bike.Lîderê Şîa Muqteda Sadr, bi daxuyaniyekê ragihand ku ji bo berjewendiyên giştî yên Iraqê, ji bo hikumeta nû xurt bibe û artêş û polîs bi hêz bibin, ev biryar girtiye.
Sadr, anî ziman ku koma Seraya es-Selam a di nav Heşdî Şebî de wê xebatên xwe tenê li derdora Bexda, Samara û başûrê welêt Kerbelayê bidomîne û derveyî van, wê yekîneyên xwe yên çekdar belav bike.
Sadr, got di rewşa heyî de fermandarê Seraya es-Selam şêwirmendê wî ye û peywireke wî ya din nîn e.
Sadr anî ziman ku ferman daye Seraya es-Selam ku çekên ji bo têkoşîna li hemberî DAÎŞ'ê ji hikûmetê wergirtine, radestî hikûmetê bikin û got li derveyî welêt pêkanîna çalakiyên leşkerî teqez qedexe kiriye.
Mukteda Sadr, roja Pênçşemê biryar dabû ku xebatên Seraya Es-Selam ên li Basrayê bide sekinandin û li Iraqê derveyî "xebatên Cîhadê" tevlîbûna wan a karekî din qedexe ye.
Sadr, beriya niha jî biryara ku xebatên milîsên xwe yên navborî yên li herêma Diyala û herêmên din bide sekinandin dabû.
Yekîneyên girêdayî Seraya Es-Selam, li hemberî êrîşên DAÎŞ'ê sala 2014'an li herêma Samara ya nêzî paytext Bexdayê bicih bibûn û hewl dabûn gorên Şîa biparêzin.

## Piştgiriya bi nobeda azadiyê re mezin dibe

Parlementerên Başûr û HDP'yiyan piştgirî dan çalakiya ji bo Ocalan.
'Nobeda ji bo azadiya Ocalan' a li ber avahiya Konseya Ewropayê 6 sal li pey xwe hişt û Kurdistanî û dostên xwe dibêjin, heya Ocalan azad bibe wê vê çalakiyê berdewam bikin.
HDP'yî û parlementerên Başûrê Kurdistanê jî piştgirî dan çalakiya ji bo azadiya Ocalan.
Nobeda 'Azadî ji Ocalan re" ku li ber avahiya Konseya Ewropayê ya li bajarê Strasboûrg ê Fransayê tê girtin, 6 sal li pey xwe hişt. Nobedarên vê hefteyê rêveberên saziyên Kongreya Civaka Demokratîk a Kurdistaniyên li Ewropayê (KCDK-E) ne. HDP'yî û parlementerên ji Başûrê Kurdistanê jî destekê didin çalakiyê. Rêveberên saziyan, ku tevî endamên Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) ji roja Yekşemê ve nobedê digirin, ji aliyekî ve agahiyan li derdorê belav dikin, li aliyê din jî semîneran li dar dixin.
Di vê çarçoveyê de bi sedan belavok hatin belavkirin û li ser nêrîn, têkoşîn û dîlgirtina Ocalan agahî hatin dayin.



Nûnerên saziyan li ser hilbijartinên 24'ê Hezîranê semînerek li dar xistin.
Parlamenterê Îzmîrê yê serdema 26'am Ertûgrûl Kurkçu jî tevlî semînerê bû. Kurkçu bal kişand ser hîle, zext û bê edaletiya di hilbijartinê de hatin kirin û got, "tevî zextên giran jî HDP'ê dengên xwe ji yên 1'ê Mijdarê zêdetir kir û cihê xwe li meclîsê girt."
Di semînerê de encamên hilbijartinê û desteka gelan a ji bo HDP'ê û bernameya wê hatin nirxandin.
Wekî din, tevlîbûnên nû û serdanên ji bo çalakgeran dewam kirin. Nûnera jinên ciwan a tevlî çalakiyê bû, da xuyakirin ku bi saya nêrînên Ocalan îro di ser Rojava re li Rojhilata Navîn şoreşek pêk tê. Çalakger diyar kir, bi hezaran mirovên dîl ketibûn destê çeteyên DAÎŞ'ê bi saya tevgera şoreşê ya bi pêşengiya nêrînên Ocalan hatin rizgarkirin û got, "civakeke ku jin lê ne azad be, nikare bi awayekî azad bijî."
Çalakger got, "Rêber Apo jiyana azad hînî me kir" û destnîşan kir ku wê jiyaneke bêyî rêberê azad qebûl nekin. Çalakgeran jin got, "Heta ku Rêber Apo azad bibe em ê çalakiyên xwe bidomînin."